

**وێنەی دراوی کوردی لە ١٨٤٧**

# چەند تێبینی لە مەڕ ئابووری کوردستان
# و
# ڕێکاری چاکسازی ئابووری

# çend têbînî le mer aburî kurdistan u rêkarî çaksazî aburî

ماوەیەک لەمەوپێش (٢٠١٦/٤/١٠) لە بابەتێک بە ناوی " گەمە و وازی سیاسی – ستراتیژیکی ڕووس و ئامریکا و دۆزی نەتەوەیی کورد و ڕێچکا سەربەخۆیی کوردستان و کۆسپ و تەگەرە و تایبەتمەندیەکانی " جە پشکا " ئاکار و تایبەتمەندی کوردستانی سەربەخۆ ، چلۆ کوردستانێک چاوەڕێمان دەکاتن ؟ " مە گوت کو :

" گەر وای دابنێن کە کورد بە سەر تێکڕای کۆسپ و تەنگ و چەڵەمەی ناوخۆیی و دەرەکی سەر ڕێچکەی سەربەخۆیی دا زاڵ ئەبێت و گۆر گەمە و وازی سیاسی ڕۆژ و سەردەم ، لە ڕێگەی گشت پرسیەوە ئەم ئامانجە ستراتیژیکی و دێرینەی خۆی واتە سەربەخۆیی جە باشووری نێشتمانەکەی دابین بکا ، ئەشێ هەر جە ئێستاوە خەڵک لەوە ئاگادار بکرێنەوە کە کورد چلۆ کوردستانێکی سەربەخۆی ئەبێتن . وەکی پێشتریچ ئاماژە وەپێ کریا ، کورد و بزاڤی ڕزگاری نەتەوەیی کورد ، جە ڕوانگەی مێژوویی یەوە ، لە کێش و وزەی دا نیە کە بەتەواوەتی سەربەخۆ بجووڵێتەوە و ئامانجە مێژوویی یەکانی بپێکێ . هەر وەک چۆن تەڤگەری نەتەوەیی دە بن کارتێکردن و باندۆرا هێزێن گاورەی فرە گاورەتر جە کوردان دە بووگە ، هەر ئاواش ئی هۆکاریەلە جیهانیی و گاورە ، مۆرکی خۆیان بە ئاکار و تایبەتمەندی ئارمانجا پێک هێنراگ ژی

Maweyek lemewpêş (10/4/2016) le babetêk be nawî " Geme u wazî siyasî – stiratîjîkî rûs u amrîka u dozî neteweyî kurd u rêçka serbexoyî kurdistan u kosp u tegere u taybetmendiyekanî " ce pişka " akar u taybetmendî kurdistanî serbexo , çlo kurdistanêk çawerêman dekatin ? " me gut ku:

" ger way dabinên ke kurd be ser têkiray kosp u teng u çelemey nawxoî u derekî ser rêçkey serbexoyî da zal ebêt u gor geme u wazî siyasî roj u serdem , le rêgey gişit pirsîewe em amance stiratîjîkî u dêrîney xoy wate serbexoyî ce başûrî nêştmanekey dabîn bika , eşê her ce êstawe xelk lewe agadar bikirênewe ke kurd çlo kurdistanêkî serbexoy ebêtin . Wekî pêştirîç amaje wepê kiriya , kurd u bizavî rizgarî neteweyî kurd , ce riwangey mêjuî yewe , le kêş u wizey da niye ke betewawetî serbexo bicûlêtewe u amance mêjuîyekanî bipêkê . Her wek çon tevgerî neteweyî de bin kartêkirdin u bandora hêzên gawrey fire gawretir ce kurdan de bûge , her awaş î hokariyele cîhanî u gawre , morkî

xoyan be akar u taybetmendî armanca pêk hênrag jî enên . Eme , le rastî da ewe egeênê ke kurdistanî serbexoyî diwaroj , ger pêkewe binrê , pirawpir ewe nabê ke kurd be giştî eyewê . Sermayedarî cîhanî le astêk daye ke bikarê ta radeyek be sanayî kar bikate ser rewte siyasî u komelayetî u mêjuîyekanî komelgay serdem. dewrî sermayedarî serdem cê girewey ew hêze împiratûriyaney kone ke paş tepînî kimonîzim u kotayî şerî sard , take siwarî gorepanî siyasî cîhane u rim bazên u teratên ekatin . A eme taybetmendî diyarî serdemekeye u dozî neteweyî kurd jî ce ulu doxêk u bin bandora vê taybetmendî emeşê u ce bandora wan bê berî niye.

ئەنێن . ئەمە ، لە ڕاستی دا ئەوە ئەگەێنێ کە کوردستانی سەربەخۆیی دواڕۆژ ، گەر پێکەوە بنرێ ، پڕاوپڕ ئەوە نابێ کە کورد بە گشتی ئەیەوێ . سەرمایەداری جیهانی لە ئاستێک دایە کە بکارێ تا ڕادەیەک بە سانایی کار بکاتە سەر ڕەوتە سیاسی و کۆمەڵایەتی و مێژوویی یەکانی کۆمەڵگای سەردەم . دەوری سەرمایەداری سەردەم جێ گرەوەی ئەو هێزە ئیمپراتووریانەی کۆنە کە پاش تەپینی کمۆنیزم و کۆتایی شەڕی سارد ، تاکە سواری گۆڕەپانی سیاسی جیهانە و ڕم بازێن و تراتێن ئەکاتن . ئا ئەمە تایبەتمەندی دیاری سەردەمەکەیە و دۆزی نەتەوەیی کورد ژی جە ولو دۆخێک و بن باندۆرا ڤێ تایبەتمەندی ئەمەشێ و جە باندۆرا وان بێ بەریی نیە.

Kurd u hîway serbexoyî kurdistan natanê ce çarçêva sermayedarî becîhanî kiraw, derbçêtin . Rewtî be cîhanî kirdinî sermaye (globalisaton) be germe emşê u kurdistanîş kewtuete naw bazney ew rewte , çar u rêkar u rêbazî dîkeşî niye . Kurdistanî serbexo, kurdistanêkî sermayedarî ebêtin. Eme yekem u diyartirîn taybetmendî misogerî kurdistanî serbexo ebêt ke nakirê u naşêt kes larî lêyî bêt . Ger wa bêt, ke her waş ebêt , îtir ebê ew kurdistane wekî parek le cîhanî sermayedarî serdem bêt u xoy wegerd merc u egerên vê cîhanê rêk bixat u wegerdî cût bût. Ewan merc u egeran jî ewen ke ew kurdistane eşê berjewendî pareperestanî cîhanî dabîn bikatin, lepley yekem u tenanet le pêş berjewendî xelkekey xoyşyewe. Lemeş fireterter , ewese ke eşê pareperestan lewe dilniya bin u dilniya bikirênewe ke ew kurdistane wekî parek stiratîjîk ji sermayedarî cîhanî j alîên abûrî u siyasî , tenanet berjewendî ewan ji dervey kurdistanîç u le astî cîhanî u nexasma nawçeî biparêzê . Mijarî abûrî u siyasî u komelayetî kurdistan ebê le aqarêkewe rêk bixirên ke ewan erk u pêdawîstî pareperestan wepiyan dabîn bikirêtin u rêge erayan xweş bikirêt , be şêweyekî stiratîjîkî . Ce doxî siyasî henûkeî cîhanî u mêjwî da , kurdistanî serbexo be tenê mîna yekeyekî sermayedarî tête wergirtin u pesend kirdin , be qursayî siyasî u abûrî u serbazî xoyewe . "

کورد و هیوای سەربەخۆیی کوردستان ناتانێ جە چارچێڤا سەرمایەداری بەجیهانی کراو ، دەربچێتن . ڕەوتی بە جیهانی کردنی سەرمایە (globalisation) بە گەرمە ئەمشێ و کوردستانیش کەوتوەتە ناو بازنەی ئەو ڕەوتە ، چار و ڕێکار و ڕێبازی دیکەشی نیە . کوردستانی سەربەخۆ ، کوردستانێکی سەرمایەداری ئەبێتن . ئەمە یەکەم و دیارترین تایبەتمەندیی مسۆگەری کوردستانی سەربەخۆ ئەبێت کە ناکرێ و ناشێت کەس لاری لێی بێت . گەر وا بێت ، کە هەر واش ئەبێت ، ئیتر ئەبێ ئەو کوردستانە وەکی پارەک لە جیهانی سەرمایەداری سەردەم بێت و خۆی وەگەرد مەرج و ئەگەرێن ڤێ جیهانێ ڕێک بخات و وەگەردی جووت بووت. ئەوان مەرج و ئەگەران ژی ئەوەن کە ئەو کوردستانە ئەشێ بەرژەوەندی پارەپەرەستانی جیهانی دابین بکاتن، لەپلەی یەکەم و تەنانەت لە پێش بەرژەوەندی خەڵکەکەی خۆیشیەوە . لەمەش فرەتەرتەر ، ئەوەسە کە ئەشێ پارەپەرەستان لەوە دڵنیا بن و دڵنیا بکرێنەوە کە ئەو کوردستانە وەکی پارەک ستراتیژیک ژ سەرمایەداری جیهانی ژ ئالیێن ئابووری و سیاسی ، تەنانەت بەرژەوەندی ئەوان ژ دەرڤەی کوردستانیچ و لە ئاستی جیهانی و نەخاسما ناوچەیی بپارێزێ . مژاری ئابووری و سیاسی و کۆمەڵایەتی کوردستان ئەبێ لە ئاقارێکەوە ڕێك بخرێن کە ئەوان ئەرک و پێداویستی پارەپەرەستان وەپیان دابین بکرێتن و ڕێگە ئەڕایان خوەش بکرێت ، بە شێوەیەکی ستراتیژیکی . جە دۆخی سیاسی هەنووکەیی جیهانیی و مێژوویی دا ، کوردستانی سەربەخۆ بە تەنێ مینا یەکەیەکی سەرمایەداری تێتە وەرگرتن و پەسەند کردن ، بە قورسایی سیاسی و ئابووری و سەربازی خۆیەوە . "

Zorî nexayand (28/4/2016) ke serokî hikumetî kurdistan be xoşhalîyewe beşdarî wajokirdinî girêbestî nêwan bankî nêwdewletî u kompanyaêkî kertî taybetî kird u le witarêk da gutî :

زۆری نەخایاند (٢٠١٦/٤/٢٨) کە سەرۆکی حکومەتی کوردستان بە خۆشحالیەوە بەشداری واژۆکردنی گرێ بەستی نێوان بانکی نێودەوڵەتی و کۆمپانیاییێکی کەرتی تایبەتی کرد و لە وتارێک دا گوتی :

"Xoşhalim emro legel êwe berêz, min u kak Qobad beşdarî le rêwresim u rûdawêkî girîngda bo herêmî kurdistan dekeyn, ke ewîş îmzakirdinî girêbestêkî nêwan endamkî giringî girûpî bankî nêwdewletî u kompanyayekî diyarî kertî taybete le herêmî kurdistan .

"خۆشحاڵم ئەمڕۆ لەگەڵ ئێوەی بەڕێز، من و کاك قوباد بەشداری لە ڕێورەسم و ڕووداوێکی گرنگدا بۆ هەرێمی کوردستان دەکەین، کە ئەویش ئیمزاکردنی گرێبەستێکی نێوان ئەندامێکی گرنگی گرووپی بانکی نێودەوڵەتی و کۆمپانیایەکی دیاری کەرتی تایبەتە لە هەرێمی کوردستان .

Ême le herêmî kurdistan berdewamîn leser pirkirdinewey kemukuriyekanî wizey kareba u bo em mebesteş stiratîjî hikûmet eweye ke le çareserkirdinî kêşe u kemukuriyekanî em kerteda, be rêjeyekî zor u ta ew şuwêney dekirêt, pişt be kertî taybet bibestêt, boye wek hemîşe hemû asankariyek pêşkeş dekat bo kertî taybet. hikûmetî herêmî kurdistan nek her be tenha le kertî karebada, belkû deyewêt le hemû kertekanî xizmetguzarî giştîda, pişt be kertê taybet bibestêt u rolêkî ziyatirî bidatê, bo ewey wek le wilate pêşkewtuwekanda heye, kertî taybet bitwanêt zortirîn rêjey xizmetguzariyekan bigirête estoy xoy .

ئێمە لە هەرێمی کوردستان بەردەوامین لەسەر پڕکردنەوەی کەموکوڕییەکانی وزەی کارەبا و بۆ ئەم مەبەستەش ستراتیژی حکوومەت ئەوەیە کە لە چارەسەرکردنی کێشە و کەموکوڕییەکانی ئەم کەرتەدا، بە ڕێژەیەکی زۆر و تا ئەو شوێنەی دەکرێت، پشت بە کەرتی تایبەت ببەستێت، بۆیە وەك هەمیشە هەموو ئاسانکارییەك پێشکەش دەکات بۆ کەرتی تایبەت. حکوومەتی هەرێمی کوردستان نەك هەر بە تەنها لە کەرتی کارەبادا، بەڵکوو دەیەوێت لە هەموو کەرتەکانی خزمەتگوزاریی گشتیدا، پشت بە کەرتی تایبەت ببەستێت و ڕۆڵێکی زیاتری بداتیّ، بۆ ئەوەی وەك لە وڵاتە پێشکەوتووەکاندا هەیە، کەرتی تایبەت بتوانێت زۆرترین ڕێژەی خزمەتگوزارییەکان بگرێتە ئەستۆی خۆی .

Le rabirdûda zor be başî giringî kertî taybetman zanîwe u be hemû şêweyek piştgîrîman kirdue, êstaş bem şêweye demanewêt siyasetî geşepêdanî kertî taybet peyrew bikeyn. Em hengawey hikûmetê herêmî kurstan dekewête çwarçêwey bernamey çaksazî u bo em mebesteş ziyatir le 30 biriyarî derkirdue, ke yekêkiyan biriyarî jimare 69ye.

لە ڕابردوودا زۆر بە باشی گرنگیی کەرتی تایبەتمان زانیوە و بە هەموو شێوەیەك پشتگیریمان کردووە، ئێستاش بەم شێوەیە دەمانەوێت سیاسەتی گەشەپێدانی کەرتی تایبەت پەیڕەو بکەین. ئەم هەنگاوەی حکوومەتی هەرێمی کورستان دەکەوێتە چوارچێوەی بەرنامەی چاکسازی و بۆ ئەم مەبەستەش زیاتر لە 30 بڕیاری دەرکردووە، کە یەکێکیان بڕیاری ژمارە 69یە.

bepêy em biryare hemû damezrawe u dam u dezgakanî hikûmet hewl deden ewey le tiwanada bêt, pêşkeşkirdiny xizmetguzarîe giştiyekan, le kertî giştîewe bigwaznewe kertî taybet u teniya ew xizmetguzarîane le destîda bimêninewe, ke nakirêt le destî kertî hikûmîda nebin."

بەپێی ئەم بڕیارە هەموو دامەزراوە و دامودەزگاکانی حکوومەت هەوڵ دەدەن ئەوەی لە تواناادا بێت، پێشکەشکردنی خزمەتگوزارییە گشتییەکان، لە کەرتی گشتییەوە بگوازنەوە کەرتی تایبەت و تەنیا ئەو خزمەتگوزارییانە لە دەستیدا بمێننەوە، کە ناکرێت لە دەستی کەرتی حکوومیدا نەبن."

Hawterîb wegerd binemay em boçûn u têgeyiştin u karbokirdine le 30/5/2016 da , Nêçîrvan barzanî serokî hikemetî kurdistan le konfransî " Nexşe rêgey rîformî abûrî dirêjxayen " be rûnî binema u stiratîjî dirêjxayenî eray abûrî diwarojî kurdistan des nîşan kird u ray geyand :

هاوتەریب وەگەرد بنەمای ئەم بۆچوون و تێگەیشتن و کاربۆکردنە لە ٢٠١٦/٥/٣٠ دا ، نێچیرڤان بارزانی سەرۆکی حکەمەتی کوردستان لە کۆنفرانسی " نەخشە ڕێگەی ریفۆرمی ئابووریی درێژخایەن " بە ڕوونی بنەما و ستراتیژی درێژخایەنی ئەرای ئابووری دواڕۆژی کوردستان دەس نیشان کرد و ڕای گەیاند :

"Le binema serekiyekany plany rîformy hikûmety herêmy kurdistan, eweye ke kertî gişty beser abûrîy herêmy kurdistanda zal nebêt u derfety ziyatir bo kertî taybet le hemû biwarekanda birexsênêt. Rûy kertî taybet u weberhênany biyany u nawxoî arastey kertekany kiştukal, pîşesazî, geştiyarî, aw u hemû çalakiye abûry u bazrganiyekany dîkeş bikat. Bemeş xwast leser damezrandin le kertî giştî kem bikatewe u derfety ziyatir u baştiry kar le kertî taybetda birexsênêt. Bo em mebeste hikûmet le rêgey çend hengaw u rêkarêkewe hemû asankariyek pêşkeş dekat u çî pêwîst bêt bo handany karkirdin le kertî taybet u biçûkkirdinewey kertî gişty, encamy dedat.
hikûmetî herêmî kurdistan le çwarçêwey plany rîformîda, komelêk hengawî helnawe ke mayey sernc u destxoşî damezrawe nêwdewletiye taybetmendekan bue, wek kemkirdinewey xerciyekan, ziyadkirnî dahat, birîn u kemkirdinewey piştgîrîy daraî le kertî kareba, dabînkirdinî ziyatirî şefafiyet le pirsî dahat u xerciyekanda, hênany layenî nêwdewlety bo çawdêrîkirdiny dahat u xerciyekan u çendîn rêkary dîkeş. Belam hemû emane hêşta beş naken u herêmy kurdistan pêwîstiyekî gewrey be cêbecêkirdiny rîformêky hemelayen heye.

" لە بنەما سەرەکییەکانی پلانی ڕیفۆرمی حکوومەتی هەرێمی کوردستان، ئەوەیە کە کەرتی گشتی بەسەر ئابووریی هەرێمی کوردستاندا زاڵ نەبێت و دەرفەتی زیاتر بۆ کەرتی تایبەت لە هەموو بوارەکاندا پرەخسێنێت. ڕووی کەرتی تایبەت و وەبەرهێنانی بیانی و ناوخۆیی ئاراستەی کەرتەکانی کشتوکاڵ، پیشەسازی، گەشتیاری، ئاو و هەموو چالاکییە ئابووری و بازرگانییەکانی دیکەش بکات. بەمەش خواست لەسەر دامەزراندن لە کەرتی گشتی کەم بکاتەوە و دەرفەتی زیاتر و باشتری کار لە کەرتی تایبەتدا پرەخسێنێت. بۆ ئەم مەبەستە حکوومەت لە ڕێگەی چەند هەنگاو و ڕێکارێکەوە هەموو ئاسانکارییەك پێشکەش دەکات و چی پێویست بێت بۆ هاندانی کارکردن لە کەرتی تایبەت و بچووککردنەوەی کەرتی گشتی، ئەنجامی دەدات.
حکوومەتی هەرێمی کوردستان لە چوارچێوەی پلانی ڕیفۆرمیدا، کۆمەڵێك هەنگاوی هەڵناوە کە مایەی سەرنج و دەستخۆشیی دامەزراوە نێودەوڵەتییە تایبەتمەندەکان بووە، وەك کەمکردنەوەی خەرجییەکان، زیادکرنی داهات، پرین و کەمکردنەوەی پشتگیریی دارایی لە کەرتی کارەبا، دابینکردنی زیاتری شەفافییەت لە پرسی داهات و خەرجیەکاندا، هێنانی لایەنی نێودەوڵەتی بۆ چاودێریکردنی داهات و خەرجییەکان و چەندین ڕێکاری دیکەش. بەڵام هەموو ئەمانە هێشتا بەش ناکەن و هەرێمی کوردستان پێویستییەکی گەورەی بە جێبەجێکردنی ڕیفۆرمێکی هەمەلایەن هەیە.

Xalêky dîkey serekî rîform eweye ke kertî kargêry begiştî u kargêrîy daraî betaybetî çak dekeyn. Bo emeş debê be sîstemî kargêrî daraî hikûmî u şêwazî karkirdinî bankekanî kertî taybetda biçînewe u wa bikeyn ke bankdarî le herêmî kurdistan biçête astî standardî cîhanîewe u bankekan bitwanin bibne birbirey piştî kar u çalakiyekanî kertî taybet. Çunke ta êsta le herêmî kurdistan

خاڵێکی دیکەی سەرەکیی ڕیفۆرم ئەوەیە کە کەرتی کارگێری بەگشتی و کارگێڕیی دارایی بەتایبەتی چاك دەکەین. بۆ ئەمەش دەبێ بە سیستەمی کارگێڕیی دارایی حکوومی و شێوازی کارکردنی بانکەکانی کەرتی تایبەتدا بچینەوە و وا بکەین کە بانکداری لە هەرێمی کوردستان بچێتە ئاستی ستانداردی جیهانییەوە و بانکەکان بتوانن ببنە بڕبڕەی پشتی کار و چالاکییەکانی کەرتی تایبەت. چونکە تا ئێستا لە

sîstemî piştbestinî kertî taybet be bank zor lawaze . "

هەرێمی کوردستان سیستەمی پشتبەستنی کەرتی تایبەت بە بانك زۆر لاوازە . "

Deq u nawerokî peyvên serukê hikumetê kurdistan ç guman u dûdliyek leweda nahêlêtewe ke aqarî geşey abûrî u komelayetî kurdistan berew sermayedarî eçêtin u dezgay berîweberayetî kurdistanîç rêga eray xweş ekatin u ew çend jî wekî erkên xwe diyarî dekatin . Doxî henûkeî başûrî kurdistan ku hêj negehştiye qonaxî serbexoî u destewyexey komelêk arîşey gawre u giranî siyasî u abûrî nawxoî u derekî bûgesewe , egerî serkewtinî ulu rêbazek exate jêr pirsiyarewe . Lasaî kirdinewey sermayedarî rojawaî u kirdine mînay ewsermayedarye lo abûrî kurdistan , nexasma j doxa îrojî , lewaneye fire guncaw nebêtin pey kurdistan . Zal kirna kertî taybet be ser aburî kurdistan lem doxe da firmanêkî neşîawe .

دەق و ناوەرۆکی پەیڤێن سەروکێ حکومەتێ کوردستان چ گومان و دوودڵیەک لەوەدا ناهێڵێتەوە کە ئاقاری گەشەی ئابووری و کۆمەڵایەتی کوردستان بەرەو سەرمایەداری ئەچێتن و دەزگای بەڕیوەبەرایەتی کوردستانیچ ڕێگا ئەرای خوەش ئەکاتن و ئەو چەند ژی وەکی ئەرکێن خوە دیاری دەکاتن . دۆخی هەنووکەیی باشووری کوردستان کو هێژ نەگەهشتیە قۆناخی سەربەخۆیی و دەستەویەخەی کۆمەڵێک ئاریشەی گاورە و گرانی سیاسی و ئابووری ناوخۆیی و دەرەکی بووگەسەوە ، ئەگەری سەرکەوتنی ولو ڕێبازەک ئەخاتە ژێر پرسیارەوە . لاسایی کردنەوەی سەرمایەداری ڕۆژئاوایی و کردنە مینای ئەوسەرمایەداریە لۆ ئابووری کوردستان ، نەخاسما ژ دۆخا ئیرۆژی ، لەوانەیە فرە گونجاو نەبێتن پەی کوردستان . زاڵ کرنا کەرتی تایبەتی بە سەر ئابووری کوردستان لەم دۆخەدا فرمانێکی نەشیاوە .

Kurdistan be doxî şerî nîştmanî da tê eperê . Emeş yekem xalî girînge ke rastewxo kar ekate ser abûrî u " abûrî doxî şer " daesepênê. Abûrî doxî şer beşêkî fire gawrey abûrî lo pêdawîstiyekanî şer terxan dekat . sirncêkî ser pêî le mêjuî ulu doxêk ew rastiye xuya ekatin ke rewtî betaybetî kirdinî (Privatizaton ) kerte girîngekanî abûrî , nek her betenê rojyan niye , lê belê , pêçewanekey wate xomalî kirdin (Natonalizaton ) zal ebêtin . Le doxî şerî nîştmanî da man u neman u çarenûsî gel u nîştman be giştî ekefête ber metirsî u nakirê u naşî berjewendî netewe bidrête dest pareperestanî sermayedarî çawçinok u sû u selem xor . Yasa u rêsa u akar u kirdey sermayedarî wegerd pêdawîstî netewe u nîştmanêke xerîkî şerî man u nemane, yek nagirnewe . Têkiray ew şeraney ke le bîçmî sermayedariya tomar kirawn be rûnî derî exen ke yasa u rêsay bawî sermayedarî le doxî şerî nîştmaniya ewestin.

کوردستان بە دۆخی شەڕی نیشتمانی دا تێ ئەپەڕێ . ئەمەش یەکەم خاڵی گرینگە کە ڕاستەوخۆ کار ئەکاتە سەر ئابووری و " ئابووری دۆخی شەڕ " دائەسەپێنێ . ئابووری دۆخی شەڕ بەشێکی فرە گاورەی ئابووری لۆ پێداویستیەکانی شەڕ تەرخان دەکات . سرنجێکی سەر پێیی لە مێژووی ولو دۆخێک ئەو ڕاستیە خویا ئەکاتن کە ڕەوتی بەتایبەتی کردنی (Privatization ) کەرتە گرینگەکانی ئابووری ، نەک هەر بەتەنێ ڕۆژیان نیە ، لێ بەلێ ، پێچەوانەکەی واتە خۆماڵی کردن ( Nationalization ) زاڵ ئەبێتن . لە دۆخی شەڕی نیشتمانی دا مان و نەمان و چارەنووسی گەل و نیشتمان بە گشتی ئەکەفێتە بەر مەترسی و ناکرێ و ناشی بەرژەوەندی نەتەوە بدرێتە دەست پارەپەرەستانی سەرمایەداری چاوچنۆک و سوو وسەلەم خۆر . یاسا و ڕێسا و ئاکار و کردەی سەرمایەداری وەگەرد پێداویستی نەتەوە و نیشتمانێکە خەریکی شەڕی مان و نەمانە ، یەک ناگرنەوە . تێکڕای ئەو شەڕانەی کە لە بیچمی سەرمایەداریا تۆمار کراون بە ڕوونی دەری ئەخەن کە زۆربەی یاسا و ڕێسای باوی سەرمایەداری لە دۆخی شەڕی نیشتمانیا ئەوەستن .

Bire zaniyariyek ce mer xomalî kirdin (Natonalizaton) u betaybetî kirdin (Privatizaton) u rewtî geşekirdin u cê

پرە زانیاریەک جە مەڕ خۆماڵی کردن (Nationalization) و بەتایبەتی کردن (Privatization)

gorkêyan nemaze j rojawa , xuya ekatin ku kertî taybetî abûrî le ser serkewtin u deskewtî beşî giştî abûrî helî çinîwe u hel eçinê . Birşt u birst u wize u kêşî kertî taybetî berteske u le astî nîştmanî da dewr nabînê . Serkewtinî kertî taybetî bestirawetewe be piştgîrî u alîkarî u asankarî behêz u karîgerî berêweberayetî wilat . Şikan u doranî kertî taybetî hemîşe be ser hikumet u deselatdaranî wilat da eşkêtewe . Ger waz ji dîrokî em mijare bihênîn u betenê sirnc bideyne ser diwa qeyranî sazkirawî abûrî sermayedarî rojawa , ewe îdî kes nikarê nikûlî ji vê rastî bikat ke şikanî kertî taybetî le beşî bank u bankdarya be çi beha u nirxêkî fire gawre be ser xelkî cîhana şikayewe . Qebarey fire gawrey bacî dewletan be bankdare dorawekan le astî deyan tirîlîon dolarî Amrîkayî , bese eray wriyakirdinewe ce metirsî kertî taybetî , betaybetî le beşî sermaiyey malî u dirawî u bezmî bank u bankdarî . Bank u bankdarî lew astey rojawa u bew hemke yasa u çawedêryewe ew bela u nehametiye gaweriyan be ser xelkî cîhana hêna , ca îtir abûrî hêj seqamgîrnebuî kurdistan çon etwanî xoy le qerey weha hat u nehat u metirsiyekanî bidat u biyewê ke lasaî rojawa bikatewe anku le ser şopî ewan bimeşê .

Abûrî başûrî kurdistan lew aste da niye ku bikarê bergey şikan u doranî her beşêkî kertî taybetî bigirê u bacekey bidat . Dam u dezga zebelah u zlekanî sermayedarî cîhanî naşî ku lem rastiye agadar nebin . Her boye de hewlî ewedan ke deselatî siyasî başûrî kurdistan wek erxayenî le mjarî qerz u qoley xoyan lo beşî kertî taybetî nawxoî u tenanet î derekî bikene berpirsyarî qazanc u berjewendî diwarojiyan le kurdistan . Xalîkî fire girîng u cêy raman ewese ke hikumetî kurdistan ekirête hokarî parastinî berjewendî kertî taybetî wilatanîk wek turkye u lobnan u ordon . Ezmûnî talî salanî rabirdû derî exat ke hewsarpisawî kertî taybetî ji başûrî kurdistan çi karesat u weîşûmeyekî lê kewtewe u çon saman u dahatî xelkî wilateke be talan çû , çi

و ڕەوتی گەشەکردن و جێ گۆڕکێیان نەمازە ژ ڕۆژئاوا ، خویا ئەکاتن کو کەرتی تایبەتی ئابووری لە سەر سەرکەوتن و دەسکەوتی بەشی گشتی ئابووری هەڵی چنیوە و هەل ئەچنێ . پرشت و پرست و وزە و کێشی کەرتی تایبەتی بەرتەسکە و لە ئاستی نیشتمانی دا دەور نابینێ . سەرکەوتنی کەرتی تایبەتی بەستراوەتەوە بە پشتگیری و ئالیکاری و ئاسانکاری بەهێز و کاریگەری بەڕێوەبەرایەتی وڵات . شکان و دۆرانی کەرتی تایبەتی هەمیشە بە سەر حکومەت و دەسەڵاتدارانی وڵات دا ئەشکێتەوە . گەر واز ژ دیرۆکی ئەم مژارە بهێنین و بەتەنێ سرنج بدەینە سەر دوا قەیرانی سازکراوی ئابووری سەرمایەداری ڕۆژئاوا ، ئەوە ئیدی کەس نکارێ نکوولی ژ ڤێ ڕاستی بکات کە شکانی کەرتی تایبەتی لە بەشی بانک و بانکداریا بە چ بەها و نرخێکی فرە گاورە بە سەر خەڵکی جیهانا شکایەوە . قەبارەی فرە گاورەی باجی دەوڵەتان بە بانکدارە دۆڕاوەکان لە ئاستی دەیان تریلیۆن دولاری ئامریکایی ، بەسە ئەڕای وریاکردنەوە جە مەترسی کەرتی تایبەتی ، بەتایبەتی لە بەشی سەرمایەی ماڵی و دراویی و بەزمی بانک و بانکداری. بانک و بانکداری لەو ئاستەی ڕۆژئاوا و بەو هەمکە یاسا و چاوەدێریەوە ئەو بەڵا و نەهامەتیە گاوەریان بە سەر خەڵکی جیهانا هێنا ، جا ئیتر ئابووری هێژ سەقامگیرنەبووی کوردستان چۆن ئەتوانی خۆی لە قەرەی وەها هات و نەهات و مەترسیەکانی بدات و بیەوێ لاسایی ڕۆژئاوا بکاتەوە ئانکو لە سەر شۆپی ئەوان بمەشێ .

ئابووری باشووری کوردستان لەو ئاستە دا نیە کو بکارێ بەرگەی شکان و دۆرانی هەر بەشێکی کەرتی تایبەتی بگرێ و باجەکەی بدات . دام و دزگا زەبەلاح و زلەکانی سەرمایەداری جیهانی ناشی کو لەم ڕاستیە ئاگادار نەبن . هەر بۆیە دە هەوڵی ئەوەدان کە دەسەڵاتی سیاسی باشووری کوردستان وەک ئەرخایەنی لە مژاری قەرز و قۆڵەی خۆیان لۆ بەشی کەرتی تایبەتی ناوخۆیی و تەنانەت ئی دەرەکی بکەنە بەرپرسیاری قازانج و بەرژەوەندی دواڕۆژیان لە کوردستان . خاڵیکی فرە گرینگ و جێی ڕامان ئەوەسە کە حکومەتی کوردستان ئەکرێتە هۆکاری پاراستنی بەرژەوەندی کەرتی تایبەتی وڵاتانیک وەک تورکیە و لوبنان و ئوردون . ئەزموونی تاڵی ساڵانی ڕابردوو دەری ئەخات کە هەوسارپساویی کەرتی تایبەتی ژ باشووری کوردستان چ کارەسات و وەیشوومەیەکی لێ کەوتەوە و چۆن سامان و داهاتی خەڵکی وڵاتەکە

le deverî zerd u sewzî diwênê u ç le têkeliyan u le astî gişt kurdistana .

Weha girft u arîşeyek jî lewewe serçawe egirê ke têgeyştinî rast u dirust le yasa u rêsay abûrî u nemaze î de kertî taybetî kiz u lawaz anku hele bûge . Kar u çalakî abûrî takekes u takî komel eçête naw bazney abûrî biçûk u kertî taybetî nayan girêtewe , tenanet ji abûrî ên herî pêşkeftî u mezin da . Beşî here berçawî kertî taybetî le rewtî betaybetîkirdinî kertî giştî da seriyan heldawe . Emeyç bew wataye ke eşê kertî giştî hebê u bigate ew aste ke le rewtî betaybetîkirdina bere bere beşêk le abûrî xoy radestî kertî taybetî bikatin. Rêkarî kertî taybetî êstay başûrî kurdistan pêçewaney em yasa u rêsayeye . Hokeşî eşê ewe bêt ke abûrî kurstan ji başûr hêj nikarye ku wekî abûrî wilatêkî cê keftig u behêz dewrî xoy bibînê . Be weha taybetmendîkewe , ewe îtir gemeyekî tijî metirsî u naerxayenî ye ke girîngî ziyade le pêwîst be kertî taybetî bidrê nexasma î de derekî u le doxê şerî nîştmanî da . Doxî qeyranawî betaybet î de şer , pêçewaney em rewte daesepênê u le weha doxêkda rewtî xomalî kirdin ebête rewtî serekî abûrî newek rewtî betaybetî kirdin .

Mêjû wepêman ûşit ke her katêk deselat u dewletêk bixazê ku xoy mîna deselatîkî behêz nîşan bidat , be taybet le doxî şer u qeyranawî da , be reçawgirtinî rewtî xomalî kirdin u welananî kertî taybetî nawxoyî u derekî , ew armance epêkê . Xomalî kirdinî newt le layen fireyek le wilatanewe u herwetirîş xomalî kirdinî kanalî suîz le layen Nasr le Mîsr wênegelêkn lem pêwendiyeda . Tenanet xomalî kirdinî kompaniyaî hêndî rojeelat le layen înglîzekanewe şyawî ramane ke çon kertî taybetî bew hêz u birşt u pantayey kompaniyaî hêndî rojeelat kêşî xoparastinî nebue .

Doxî qeyranawî siyasî henûkeyî kurdistan u metirsî dûkert bûnî deselatî siyasî u abûrî kurdistan firmanêk niye ke be hend wernegîrêt . Rêkkewtinekey yekyetî u goran

به تالان چوو ، چ له دەڤەری زەرد و سەوزی دوێنێ و چ له تێکەڵیان و له ئاستی گشت کوردستانا .

وەها گرفت و ئاریشەیەک ژی لەوەوە سەرچاوە ئەگرێ کە تێ گەیشتنی ڕاست و دروست له یاسا و ڕێسای ئابووری و نەمازە ئی دە کەرتی تایبەتی کز و لاواز ئانکو هەڵە بووگە . کار و چالاکی ئابووری تاکەکەس و تاکی کۆمەڵ ئەچێتە ناو بازنەی ئابووری بچووک و کەرتی تایبەتی نایان گرێتەوە ، تەنانەت ژ ئابووری ێن هەری پێشکەفتی و مەزن دا . بەشی هەرە بەرچاوی کەرتی تایبەتی له ڕەوتی بەتایبەتیکردنی کەرتی گشتی دا سەریان هەڵداوە . ئەمەیچ بەو واتایە کە ئەشێ کەرتی گشتی هەبێ و بگاتە ئەو ئاستە کە له ڕەوتی بەتایبەتیکردنا بەرە بەرە بەشێک له ئابووری خۆی ڕادەستی کەرتی تایبەتی بکاتن . ڕێکاری کەرتی تایبەتی ئێستای باشووری کوردستان پێچەوانەی ئەم یاسا و ڕێسایە. هۆکەشی ئەشێ ئەوە بێت کە ئابووری کورستان ژ باشوور هێژ نکاریە کو وەکی ئابووری وڵاتێکی جێ کەفتگ و بەهێز دەوری خۆی ببینێ . بە وەها تایبەتمەندیکەوە ، ئەوە ئیتر گەمەیەکی تژی مەترسی و نائەرخایەنی یە کە گرینگی زیادە له پێویست بە کەرتی تایبەتی بدرێ نەخاسما ئی دە دەرەکی و له دۆخێ شەڕی نیشتمانی دا . دۆخی قەیراناوی بەتایبەت ئی دە شەر ، پێچەوانەی ئەم ڕەوتە دائەسەپێنێ و له وەها دۆخێکدا ڕەوتی خۆماڵی کردن ئەبێتە ڕەوتی سەرەکی ئابووری نەوەک ڕەوتی بەتایبەتی کردن .

مێژوو وەپێمان ئووشت کە هەر کاتێک دەسەڵات و دەوڵەتێک بخازێ کو خۆی مینا دەسەڵاتیکی بەهێز نیشان بدات ، بە تایبەت له دۆخی شەڕ و قەیراناوی دا ، بە ڕەچاوگرتنی ڕەوتی خۆماڵی کردن و وەلانانی کەرتی تایبەتی ناوخۆیی و دەرەکی ، ئەو ئارمانجە ئەپێکێ . خۆماڵی کردنی نەوت له لایەن فرەیەک له وڵاتانەوە و هەروەتریش خۆماڵی کردنی کاناڵی سوئیز له لایەن ناسر له میسر وێنەگەلێکن لەم پێوەندیەدا . تەنانەت خۆماڵی کردنی کۆمپانیای هێندی ڕۆژهەڵات له لایەن ئینگلیزەکانەوە شیاوی ڕامانە کە چۆن کەرتی تایبەتی بەو هێز و بڕشت و پانتایەی کۆمپانیای هێندی ڕۆژهەڵات ، کێشی خۆپاراستنی نەبووە .

دۆخی قەیراناوی سیاسی هەنووکەیی کوردستان و مەترسی دووکەرت بوونی دەسەڵاتی سیاسی و ئابووری کوردستان فرمانێک نیە کە بە هەند

em metirsiyey fire zeqterter kirdwetewe . Balorey herêmî kerkûk u slêmanî zengî metirsî gawreye eray abûrî kurdistan le dahatuî dûr u nizîk da . Qeyranî abûrî u kurt hênanî dirawî birstî le jiyanî xelk birîwe . Qeyranî siyasî u şere hizb u hizbayetî binemay yasaî deselat u serwerî nîştmanî kurdanî ji başûr kiz u lawaz kirdwe ger nebêjîn leq kirdwe . Encumenî niwênerayetî lekarkewtwe u daxirawe. Asoyêkî rûn eray zal bûn beser qeyranî siyasî xuya nabêtin . Şerî nîştmanî dirêjey hes u tête çaweriwan kirdin ku hêj xest tir u çrtir bêtewe . Geşey abûrî le weha doxêk da xewnîş niye . Ewey ke kertî taybetî derekî u bankî cîhanî u sinduqî cîhanî diraw u dezgayek wekî IMF kurdekeo maço wek dalekerxore temûrey başûrî kurdistanyan dawe , bew wata niye ke asoy abûrî kurdistan fire rûne u cêgey hîwaye. serkirdayetî u deselatdaranî başûr eşê pêş her çitêk de hewlî çareserkirdinî qeyranî siyasî u arîşey nawxoî da bin . Kurdistan ebê be dam u dezga u damezrawe u sazî yasaî bawî serdem teyar bikirêt . Axir çon ekirê mjarî qerz u qole u sû dan be bê pêrageyştinî encumenî niwêneran gengeşe bikirêtin . Xo sûxoran u qerzderan be bê pesendî encumenî niwêneran u misogerkirdinî berjewendiyan le rêgey yasaî yewe , sat u sewda degel kes naken u ke kirdîşiyan , eşî bîr le tepke u tewnî namirovaneyan bikirêtewe . Ba îdî gemey syasy u destêwerdanî dereky nemaze î de dagîrkeran biwestê .

Ewey ke pareperestan rû ekene wilatêk mîna başûrî kurdistan , le ber çawî ciwan u kalî kurdan niye , belku milumoy bonî zêr u zîv u newt u gaze ke kasî kirdûn u berew nîştmanî kurdaniyan raekêşê. Sûxoran sûderkî çatir le kurd u kurdistaniyan des nakewê . Ger waz le doxî siyasî naseqamgîrî kurdistanîç bihênîn , ewe îdî nirxî suwî here berz u berztir le zorbey here zorî wilanî dîke gêngel exate mêşk sûxoran u melaşuiyan exurênê . Nirxî sû hawterîb wegerd firmanî bac u zîdebac (VAT) u helawsanî abûrî , keresey serekî u bizuwênerî serekî sermaye , nexasma

وەرنەگیرێت . ڕێککەوتنەکەی یەکیەتی و گۆران ئەم مەترسیەی فرە زەقتەرتەر کردوەتەوە . بالۆرەی هەرێمی کەرکووک و سلێمانی زەنگی مەترسی گاورەیە ئەڕای ئابووری کوردستان لە داهاتووی دوور و نزیک دا . قەیرانی ئابووری و کورت هێنانی دراویی برستی لە ژیانی خەڵک پڕیوە . قەیرانی سیاسی و شەڕە حزب و حزبایەتی بنەمای یاسایی دەسەڵات و سەروەری نیشتمانیی کوردانی ژ باشوور کز و لاواز کردوە گەر نەبێژین لەق کردوە . ئەنجومەنی نوێنەرایەتی لەکارکەوتوە و داخراوە. ئاسۆیێکی ڕوون ئەڕای زاڵ بوون بەسەر قەیرانی سیاسی خویا نابێتن. شەڕی نیشتمانی درێژەی هەس و تێتە چاوەڕوان کردن کو هێژ خەست تر وچڕتر بێتەوە . گەشەی ئابووری لە وەها دۆخێک دا خەونیش نیە . ئەوەی کە کەرتی تایبەتی دەرەکی و بانکی جیهانی و سندوقی جیهانی دراو و دەزگایەک وەکی IMF کوردەکەو ماچۆ وەک داڵەکەرخۆرە تەموورەی باشووری کوردستانیان داوە ، بەو واتا نیە کە ئاسۆی ئابووری کوردستان فرە ڕوونە و جێگەی هیوایە . سەرکردایەتی و دەسەڵاتدارانی باشوور ئەشێ پێش هەر چتێک دە هەوڵی چارەسەرکردنی قەیرانی سیاسی و ئاریشەی ناوخۆیی دا بن . کوردستان ئەبێ بە دام و دەزگا و دامەزراوە و سازی یاسایی باوی سەردەم تەیار بکرێت . ئاخر چۆن ئەکرێ مژاری قەرز و قۆڵە و سوو دان بە بێ پێڕاگەیشتنی ئەنجومەنی نوێنەران گەنگەشە بکرێتن . خۆ سووخۆران و قەرزدەران بە بێ پەسەندی ئەنجومەنی نوێنەران و مسۆگەرکردنی بەرژەوەندیان لە ڕێگەی یاسایی یەوە، سات و سەودا دەگەڵ کەس ناکەن و کە کردیشیان ، ئەشی بیر لە تەپکە و تەونی نامرۆڤانەیان بکرێتەوە ، با ئیدی گەمەی سیاسی و دەس تێوەردانی دەرەکی نەمازە ئی دە داگیرکەران بوەستێ .

ئەوەی کە پارەپەرەستان روو ئەکەنە وڵاتێک مینا باشووری کوردستان ، لە بەر چاوی جوان و کاڵی کوردان نیە ، بەڵکو ملۆمۆی بۆنی زێڕ و زیو و نەوت و گازە کە کاسی کردوون و بەرەو نیشتمانی کوردانیان ڕائەکێشێ . سووخۆران سوودەرێکی چاتر لە کورد و کوردستانیان دەس ناکەوێ . گەر واز لە دۆخی سیاسی ناسەقامگیری کوردستانیچ بهێنین ، ئەوە ئیدی نرخی سووی هەرە بەرز و بەرزتر لە زۆربەی هەرە زۆری ولانی دیکە گێنگەڵ ئەخاتە مێشک سووخۆران و خروو ئەخاتە مەڵاشوویان . نرخی سوو هاوتەریب وەگەرد فرمانی باج و زیدەباج (VAT) و هەلاوسانی ئابووری ، کەرەسەی سەرەکی و

sermayey malî u dirawî ye . Le doxî qeyranî abûrî henûkeyî da , mirîşkî sermayedarî le rojawa le kirkewtue . Bacî qurs u rengawreng u fire çeşin , birşt u birstî le sermayey rojawaî birîwe . Nirxî sû le nizim tirîn astî xoy u xoy le hîç edat lo maweyekî dûr u drêj u asoêkî rûn eray helsanewey niye u nabînrê . Nawende zil u serekiyekanî darêjeran u berêweberanî siyasetî malî u abûrî wekî banke nawendyekanî Amrîka u Awrûpa hemû salê le lêkdanewe u helsengandin u pîşbînî kirdinî doxî abûrî cîhanî , sîma u asoyêkî lêl u tarîk des nîşan eken . A le weha doxêkî be mebest lebarçuî abûrî cîhanî , çinînewey sû be yekêk le nirxe berzekan le cîhana , le kurdistan ebête hokarêkî pir be hêz eray rakêşanî sermayey le kirkewtuî pareperestanî rojawayî . Kurdistan ebête mrîşkêk ke kurdekew maço hêlkey dû zerdêne erayan keyt .

بزوێنەری سەرەکی سەرمایە ، نەخاسما سەرمایەی ماڵی و دراویی یە . لە دۆخی قەیرانی ئابووری هەنووکەیی دا ، مریشکی سەرمایەداری لە ڕۆژئاوا لە کڕکەوتووە . باجی قورس و ڕەنگاوڕەنگ و فرە چەشن ، بڕشت و بڕستی لە سەرمایەی ڕۆژئاوایی بڕیوە . نرخی سوو لە نزم ترین ئاستی خۆی و خۆی لە هیچ ئەدات لۆ ماوەیەکی دوور و درێژ و ئاسۆێکی ڕوون ئەڕای هەڵسانەوەی نیە و نابینرێ . ناوەندە زل و بڕیاردەر سەرەکیەکانی داڕێژەران و بەرێوەبەرانی سیاسەتی ماڵی و ئابووری وەکی بانکە ناوەندیەکانی ئامریکا و ئاورووپا هەموو ساڵێ لە لێکدانەوە و هەڵسەنگاندن و پیش بینی کردنی دۆخی ئابووری جیهانی ، سیما و ئاسۆیێکی لێڵ و تاریک دەس نیشان ئەکەن . ئا لە وەها دۆخێکی بە مەبەست لەبارچووی ئابووری جیهانی، چنینەوەی سوو بە یەکێک لە نرخە بەرزەکان لە جیهانا ، لە کوردستان ئەبێتە هۆکارێکی پڕ بە هێز ئەڕای ڕاکێشانی سەرمایەی لە کڕکەوتووی پارەپەرەستانی ڕۆژئاوایی. کوردستان ئەبێتە مریشکێک کە کوردەکەو ماچۆ هێلکەی دوو زەردێنە ئەڕایان کەیت .

Dab u yasa u rêsay qerz u qole u nirxî sû u mercekanî , helî dawe lo firmanêkî fire aloz u têkçirjaw u kurd gutenî mîrza u lêzanî fire baş tiwat taweku welî tê bigey . Qerz kirdin le bankî cîhanî u hawşêwe u haw stiratîjiyekanî teniya wergirtinî bire pareyek be nirxî suî diyarîkirawewe lewan niye . Sûxoran lo sûderan dyarî eken ke pareke çun u le çi rêgeêkewe bikar bihênrê u bibrêtewe . Lêgire îdî ewe sû xore ke syasetî abûrî u lemeyşewe syasetî komelayetî lo sûderan dyarî ekatin . Em şêwaze fêlawî u xapênere way kirdwe u wa ekat ke sûderî laremil u mil keçî sûxoran u mercekanyan , paş maweyek u diway ewey ke birî qerzekeyan çendîn car dawetewe , hêşta le jêr barî qerz u sû dernaçin u qerzeke weku ejdîhay hewt ser de mil u estoyan dealê u rêgay derbaz bûnyan lê egêrêt .

داب و یاسا و ڕێسای قەرز و قوڵە و نرخی سوو و مەرجەکانی ، هەڵی داوە لۆ فرمانێکی فرە ئاڵۆز و تێکچڕژاو و کورد گوتەنی میرزا و لێزانی فرە باش توات تاوەکو وەلی تێ بگەی . قەرز کردن لە بانکی جیهانی و هاوشێوە و هاو ستراتیژیەکانی تەنیا وەرگرتنی بڕە پارەیەک بە نرخی سووی دیاریکراوەوە لەوان نیە . سووخۆران لۆ سوودەران دیاری ئەکەن کە پارەکە چون و لە چ ڕێگەیێکەوە بکار بهێنرێ و ببڕێتەوە . لێگرە ئیدی ئەوە سوو خۆرە کە سیاسەتی ئابووری و لەمێشەوە سیاسەتی کۆمەڵایەتی لۆ سوودەران دیاری ئەکاتن . ئەم شێوازە فێڵاوی و خاپێنەرە وای کردوە و وائەکات کە سوودەری لارەمل و مل کەچی سووخۆران و مەرجەکانیان ، پاش ماوەیەک و دوای ئەوەی کە بڕی قەرزەکەیان چەندین جار داوەتەوە ، هێشتا لە ژێر باری قەرز و سوو دەرنەچن و قەرزەکە وەکو ئەژدیهای حەوت سەر دە مل و ئەستۆیان دەئاڵێ و ڕێگای دەرباز بوونیان لێ ئەگێرێت .

Ca weî lewey qerz u suî pareperestanî bo helnesûrê u mercekanyan dabîn nekat . Wîliyam Şkîspîr le şanoy " Bazrganî Vînîs " da akar u taybetmendî kesayetî sû xorêkî vinîsî exate rû ke le egerî fewtanî parekey , mercî ewe daenê ke kîloyek (birêk) guşt be dilî xoy le leşî qerzdarekey bikatewe . Pareperestan u sûxoranî serdemî êmegelîç çitêkî eotoyan

جا وەی لەوەی قەرز و سووی پارەپەرەستانی بۆ هەڵ نەسووڕێ و مەرجەکانیان دابین نەکات . ویلیام شکیسپیر لە شانۆی " بازرگانی ڤینیس " دا ئاکار و تایبەتمەندی کەسایەتی سوو خۆرێکی ڤنیسی ئەخاتە ڕوو کە لە ئەگەری فەوتانی پارەکەی ، مەرجی ئەوە دائەنێ کە کیلۆیەک (بڕێک) گوشت بە دڵی خۆی لە لەشی قەرزدارەکەی بکاتەوە . پارەپەرەستان

le bazrgane vînîsîekey Wîliyam Şkîspîr kemtir niye .

Ewey ke pareperestan u nexasma sûxoran le kurdistan çawyan tê birîwe , saman u dahatî siruştî kurdistan u newt u gazîş le pêş hemuyane . Her em serçawey dahatî nîstmaniyey kurdistanîç desmaye u binaxey sat u sewday kurdgele wegerd ewan . Samaneke le astêk daye ke etwanê jiyanêkî başî serdemyane pey kurdyel misoger bikatin , eger kurd xoy wek pêwîst dekarî bihênê u pêy rabigat . Keftine naw bezim u rezmî qerz u qole u sûxoranî çuwederkirdû metirsî ewe be kirdewe dirust ekatin ke samaneke be talan birwat . Xizmetêke kompaniyaêkî kertî taybetî derekî le ser binemay qerzî nêwdewletî lo kurdanî dabîn ekat , be çendîn qat girantir le ser kurd ekewê . Xo eger kertî taybetî nawxoyî u nîştmanî be erkî dabîn kirdinî heman xizmet u xizmetkirdin rabigat , ewe fire firetir le berjewendî kurd daye . Lemeş firetir , eweş le bazney deselatî kurdîş daye ke lêpirsînewe u çawedêrî u lê pêçanewe lem kerte xomalî ye bikat le her egerêk da u lel emeş egerî serkewtin u pêşkewtinî firetir bikat .

Le bernamey çaksazî hikumetî kurdistan da , erk u firmanî dewlet be tewawetî rûn niye . Yasa u rêsay pêwîst diyarî nekirawe ke eşê le egerî karakirdinewey encumenî niwêneran le layen niwêneranî gel u netewewe pesend bikirêt . Dewrî hikumetî kurdistan le sat u sewday qerz u deyndarya ebê rûn bêt . Kê qerz ekat u kê qerzdare u kê erkî danewey qerzeke u rêkare abûriyekay ekewête ser şan. Ewey rûne ewese ke qerzeke be pişt bestin be samanî siruştî kurdistan tête arawe. Wate ew samane eşê danewey qerzeke misoger bikat . Rêkar u mercî sûxoran u qerzderanî nêwdewletîş be raşkawî le gelê biwarda çoniyetî u rêkarî pêrageyştin bew samane diyarî eken . Emeş egate ew aste metirsî dare ke erkî pêrageyştin be samanî neteweyî le des kurd derbçêt , wek le zor nimûney dîkey wilatanî tira berçaw ekewê . Başûrî kurdistan maweyeke be germe xerîkî

و سووخۆرانی سەردەمی ئێمەگەلیچ چتێکی ئەوتۆیان لە بازرگانە ڤینیسیەکەی ویلیام شکیسپیر کەمتر نیە .

ئەوەی کە پارەپەرەستان و نەخاسما سووخۆران لە کوردستان چاویان تێ بڕیوە ، سامان و داهاتی سروشتی کوردستان و نەوت و گازیش لە پێش هەموویانە . هەر ئەم سەرچاوەی داهاتی نیستمانیەی کوردستانیچ دەسمایە و بناخەی سات و سەودای کوردگەلە وەگەرد ئەوان . سامانەکە لە ئاستێک دایە کە ئەتوانێ ژیانێکی باشی سەردەمیانە پەی کوردیەل مسۆگەر بکاتن ، ئەگەر کورد خۆی وەک پێویست دەکاری بهێنێ و پێی ڕابگات . کەفتنە ناو بەزم وڕزمی قەرز و قوڵە و سووخۆرانی چووەدەرکردوو ، مەترسی ئەوە بە کردەوە دروست ئەکاتن کە سامانەکە بە تاڵان بڕوات . خزمەتێکە کۆمپانیایێکی کەرتی تایبەتی دەرەکی لە سەر بنەمای قەرزی نێودەووڵەتی لۆ کوردانی دابین ئەکات ، بە چەندین قات گرانتر لە سەر کورد ئەکەوێ . خۆ ئەگەر کەرتی تایبەتی ناوخۆیی و نیشتمانی بە ئەرکی دابین کردنی هەمان خزمەت و خزمەتکردن ڕابگات ، ئەوە فرە فرەتر لە بەرژەوەندی کورد دایە . لەمەش فرەتر ، ئەوەش لە بازنەی دەسەڵاتی کوردیش دایە کە لێپرسینەوە و چاوەدێری و لێ پێچانەوە لەم کەرتە خۆماڵی یە بکات لە هەر ئەگەرێک دا و لەل ئەمەش ئەگری سەرکەوتن و پێشکەوتنی فرە تر بکات .

لە بەرنامەی چاکسازی حکومەتی کوردستان دا ، ئەرک و فرمانی دەوڵەت بە تەواوەتی ڕوون نیە . یاسا و ڕێسای پێویست دیاری نەکراوە کە ئەشێ لە ئەگەری کاراکردنەوەی ئەنجومەنی نوێنەران لە لایەن نوێنەرانی گەل و نەتەوەوە پەسەند بکرێت . دەوری حکومەتی کوردستان لە سات و سەودای قەرز و دەینداریا ئەبێ ڕوون بێت . کێ قەرز ئەکات و کێ قەرزدارە و کێ ئەرکی دانەوەی قەرزەکە و ڕیکارە ئابووریەکای ئەکەوێتە سەر شان . ئەوەی ڕوونە ئەوەسە کە قەرزەکە بە پشت بەستن بە سامانی سروشتی کوردستان تێتە ئاراوە . واتە ئەو سامانە ئەشێ دانەوەی قەرزەکە مسۆگەر بکات . رێکار و مەرجی سووخۆران و قەرزدەرانی نێودەوڵەتیش بە ڕاشکاوی لە گەلێ بواردا چۆنیەتی و ڕێکاری پێڕاگەیشتن بەو سامانە دیاری ئەکەن . ئەمەش ئەگاتە ئەو ئاستە مەترسی دارە کە ئەرکی پێڕاگەیشتن بە سامانی نەتەوەیی لە دەس کورد دەربچێت ، وەک لە زۆر نموونەی دیکەی وڵاتانی ترا بەرچاو ئەکەوەێ . باشووری کوردستان ماوەیەکە بە

eweye ke serbexoyî abûrî lo xoy dabîn bikat ke firmanêkî be cê u rewaye . lê , bezmî qerz u qole u rewtî şarawe u ne şarawekey le dahatuêkî nizîk da em firmane tûşî astengî u berbestî sûr u metirsîdar ekatin .

Merdim kurdistan u serkirdayetîekey natanin u neşên qet waz le serbexoî aburî kurdistan bihênin , çi le rewtî berew serbexoî çun u çi le egerî serbexobunî kurdistan . doxekey kurd u kurdistan mîna netewe u nîştimanêk ke tazebetaze pêy nawete qonaxî serbexoî neteweî , fire cyawaze lew netewe u wilatane ke ce mêj de serwerî neteweîyan desteber kirdige .Aburî kurdistan wek binema u jêrxanî syasy u komelayetî u ferhengî eşê biwarî serbexo bunî pêwîstî wek pêwîst lo dabîn u misoger bikrêtin , bebê hîç em la u ew layêk. Kertî taybetî nawxoî bêgoman şwên u cêgey xoy uebê lem bwareda u le çiwarçêwey bîçimy sermayedary kurdistana u eşê dewrî tewawkerî xoy lo aburî kurdistan be giştî bibînê u bîgêrê . Lê , kertî taybetî derekî be hîç kloncêk nabê cêgey kertî taybetî neteweî u nîştmanî bigrêtewe anku lemeş xratir şwênî pê çol bikat u dewrî lawaz bikatewe , her le ber ewey ke lewaneye karygertir bin le î de xomalî . ewey ke suxoranî nêwdewletî le rêgay kertî taybetî derekî xoyan le karubarî aburî u komelayetî u syasy kurdistan heleqwrtênin , bêcge le sax kirdnewey birêkî berçaw le samanî kurdistan lo xoyan , ebête serîawe u hokarî berbewt kirdnî serbexoî aburî kurdistan tenanet lew astey ke doxî cîhanî bwar we pî edatin .

Gomanîş leweda niye ke kertî taybetî le kurdistan newekame u hêj mawyetî, kurdekeo maço, keîele bêt u pêbigat . em rastyeş nabê bibête hîç pakaneêk eray pêşxstin u bazdanî kertî taybetî derekî be seryan da . kertî taybetî kurdistan ebê be runî lewe agadar bikrênewe ke dewrî ewan le afirandinî kurdistanî serbexo u dabîn u misoger kirina jîn u jîyarek a serdemîane j gelê kurd re , fire girîngtir u girantire lew mencele yaprax u goşt u birncey ke eray pêşmergey eben .

گەرمە خەریکی ئەوەیە کە سەربەخۆیی ئابووری لۆ خۆی دابین بکات کە فرمانێکی بە جێ و ڕەوایە . لێ ، بەزمی قەرز و قوڵە و ڕەوتە شاراوە و نە شاراوەکەی لە داهاتوویێکی نزیک دا ئەم فرمانە تووشی ئاستەنگی و بەربەستی سوور و مەترسیدار ئەکاتن.

مەردم کوردستان و سەرکردایەتیەکەی ناتانن و نەشێن قەت واز لە سەربەخۆیی ئابووری کوردستان بهێنن، چ لە ڕەوتی بەرەو سەربەخۆیی چوون و چ لە ئەگەری سەربەخۆبوونی کوردستان . دۆخەکەی کورد و کوردستان مینا نەتەوە و نێشتمانێک کە تازەبەتازە پێی ناوەتە قۆناخی سەربەخۆیی نەتەوەیی ، فرە جیاوازە لەو نەتەوە و وڵاتانە کە جە مێژ دە سەروەری نەتەوەییان دەستەبەر کردگە . ئابووری کوردستان وەک بنەما و ژێرخانی سیاسی و کۆمەڵایەتی و فەرهەنگی ئەشێ بواری سەربەخۆ بوونی پێویستی وەک پێویست لۆ دابین و مسۆگەر بکرێتن ، بەبێ هیچ ئەم لا و ئەو لایێک . کەرتی تایبەتی ناوخۆیی بێگومان شوێن و جێگەی خۆی ئەبێ لەم بوارەدا و لە چوارچێوەی بیچمی سەرمایەداری کوردستانا ئەشی دەوری تەواوکەری خۆی لۆ ئابووری کوردستان بە گشتی ببینێ و بیگێڕێ . لێ ، کەرتی تایبەتی دەرەکی بە هیچ کلونجێک نابێ جێگەی کەرتی تایبەتی نەتەوەیی و نیشتمانی بگرێتەوە ئانکو لەمەش فرە خراتر شوێنی پێ چۆڵ بکات و دەوری لاوازتر بکاتەوە ، هەر لەبەر ئەوەی کە لەوانەیە کاریگەرتر بن لە ئی دە خۆماڵی . ئەوەی کە سووخۆرانی نێودەوڵەتی لە ڕێگای کەرتی تایبەتی دەرەکی خۆیان لە کاروباری ئابووری و کۆمەڵایەتی و سیاسی کوردستان هەڵ ئەقورتێنن ، بێجگە لە ساخ کردنەوەی پڕێکی بەرچاو لە سامانی کوردستان لۆ خۆیان ، ئەبێتە سەرچاوە و هۆکاری بەربەست کردنی سەربەخۆیی ئابووری کوردستان تەنانەت لەو ئاستەی کە دۆخی جیهانی بوار وەپی ئەداتن .

گۆمانیش لەوەدا نیە کە کەرتی تایبەتی لە کوردستان نەوەکامە و هێژ ماویەتی ، کوردەکەو ماچۆ ، کەچەڵە بێت و پێ بگات . ئەم ڕاستیەش نابێ ببێتە هیچ پاکانەیەک ئەڕای پێش خستن و بازدانی کەرتی تایبەتی دەرەکی بە سەریاندا . کەرتی تایبەتی کوردستان ئەبێ بە ڕوونی لەوە ئاگادار بکرێنەوە کە دەوری ئەوان لە ئافراندی کوردستانی سەربەخۆ و دابین و مسۆگەرکرنا ژین و ژیارەک ئا سەردەمیانە ژ گەلێ کورد رە ، فرە گرینگتر و گرانترە لەو مەنجەڵە یاپراخ و گوشت و برنجەی کە ئەڕای هێزی پێشمەرگەی ئەبەن .

Erkî mêjuî dabîn kirnî serbexoî kurd u kurdistan u vejandna ferheng u çanda kurdî u perwerdey taky kurd be akarî neteweî u nîştmanî , fire fire lewe ziravterter u grîngtere ku bikrê rasipardey kertî taybetî derekî u suxoranî nêwdewletî alykar u piştgîr u beratderyan , nexasma î de aceman u tirkan u areban bikrêtin , le her astêk da . firmanêkî hana dij be rewtî serbexoî kurd u kurdistan u berjewendî dîrokî xak w xelkî kurdistan dewr ebînê, wek ezmunî cîhanî pişt rastî ekatewe .

Lemeş firetir , pişt bestin be kertî taybetî derekî ebête hoy ewe ke xizmetêke ke be nirxêkî diyarîkiraw le layen deselatî kurdî anku kertî taybetî xomalî egate des xelkî kurd , be çendîn qat hel bidat bewey ke eşê berjewendî u qazancî kompanyaêkî derekî u suwî sûxoranîş bikewête banî . Le hêndêk biwarî pêşesazî tazebabet da nikûlî lem firmane nakirêt u kurd eşî bacî diwakewtuî pîşesazî salanî dûr u dirêjî dagîrkirawî bidat , lo maweyekî dyarîkiraw . Belam dabîn kirdinî xizmetkarî giştî u bjêwî xelk (aw) nabê u naşî bidrête kertî taybetî derekî wek le rêkarî çaksaziyekey hikumetî herêm amajey pêkirawe .

kardox
komeley yeksanî kurdistan
31/5/2016

ئەرکی مێژوویی دابین کردنی سەربەخۆیی کورد و کوردستان و ڤەژاندنا فەرهەنگ و چاندا کوردی و پەروەردی تاکی کورد بە ئاکاری نەتەوەیی و نیشتمانی ، فرە فرە لەوە زراڤتەرتەر و گرینگتەرە کو بکرێ ڕاسپاردەی کەرتی تایبەتی دەرەکی و سووخۆرانی نێودەوڵەتی ئالیکار و پشتگیر و بەراتدەریان ، نەخاسما ئی دە عەجەمان و ترکان و عارەبان بکرێتن ، لە هەر ئاستێک دا . فرمانێکی هانا دژ بە ڕەوتی سەربەخۆیی کورد و کوردستان و بەرژەوەندی دیرۆکی خاک و خەڵکی کوردستان دەور ئەبینێ ، وەک ئەزموونی جیهانی پشت ڕاستی ئەکاتەوە .

لەمەش فرەتر ، پشت بەستن بە کەرتی تایبەتی دەرەکی ئەبێتە هۆی ئەوە کە خزمەتێکە کە بە نرخێکی دیاریکراو لە لایەن دەسەڵاتی کوردی ئانکو کەرتی تایبەتی خۆماڵی ئەگاتە دەس خەڵکی کورد ، بە چەندین قات هەڵ بدات بەوەی کە ئەشێ بەرژەوەندی و قازانجی کۆمپانیایێکی دەرەکی و سووی سووخۆرانێش بکەوێتە بانی . لە هێندێک بواری پێشەسازی تازەبابەت دا نکوولی لەم فرمانە ناکرێت و کورد ئەشی باجی دواکەوتوویی پیشەسازی ساڵانی دوور و درێژی داگیرکراوی بدات ، لۆ ماوەیەکی دیاریکراو . بەڵام دابین کردنی خزمەتکاری گشتی و بژیوی خەڵک (ئاو) نابێ و ناشی بدرێتە کەرتی تایبەتی دەرەکی وەک لە ڕێکاری چاکسازیەکەی حکومەتی هەرێم ئاماژەی پێکراوە .

کاردۆخ
کۆمەڵەی یەکسانیی کوردستان
٢٠١٦/٥/٣١